KOMELEYA NIVÎSKARÊN KURD
KÜRT YAZARLAR DERNEĞİ
KURDISH WRITERS' ASSOCIATION
2004

Ji bîr û raya gişti re,

Weke ku ji raya giştî û derdorên bihîstiyar ve jî eyan e, rojnameya Azadiya Welat di 16 salên bihurî de di gelek neqebên teng û tahl re derbas bûye. Ev rojnameya ku deng û rengê kurdî ye û îro li ser axa welatê xwe rojane weşana xwe didomîne, cara duyemîn e ku bi biryara girtinê re rûbirû dibe.

Biryara girtina ji bo heyvekê, ku ji hêla 12`emîn Dadgeha Cezayê Giran a Stenbolê hatiye wergirtin, li gorî zagonên heyî dibe ku biryareke hiqûqî be.

Ev hiqûqiyet nayê wateyê ku ev biryar biryareke rewa û meşrû ye.

Di serdemeke ku seranserê welat ketiye nava aramî û jiyîneke surişti, bi zagonên xal bi xal ji êrîşên leşkerî tûndtir û tûjtir girtina rojnameyek xwerû kurdî, di pêngava pêvajoya çalakî û xwepêşandanên di bin sernavê 'Êdî bes e em perwerdeya bi zimanê xwe dixwazin' de; wergirtin û cîbicî kirin, divê weke girtin û gemlêdana li devê hemû kurdan bêt dîtin û nîrxandin!

Di dinyaya hemdem de yek ji erkên dewletbûyînê di gel ku rêlibervekirina azadiya agahdarkirin û ragihandinê ye, dewleta ku li derveyî welat pişgir û pastariya mefan mirovan û kêmneteweyên Tirkên Qibris, Çeçenên Rûsyayê dike; li hûndir, di nava sînorê welatê xwe de bi zagonên hûşker berê xwe dide zimanê kurdî; çand, wêje û tekane rojnameya qewmê di nava xwe de; Azadiya Welat!

Komeleya Nivîskarên Kurd, di pêvajoya lêxwedîderketina li zimanê kurdî de, bi rêya vê daxuyaniyê bangî rayedar û reveberiya dewletê dike, ku hemû xalên astenker yên di nava Zagona Têkoşîna Bi Terorê re' di ber çavan re derbas bike, û xalên navborî yên ku azadiya raman, derbirînê, ragihandine, agahdarkirinê… derbend dike, rake an jî ji nû ve bi şêweyeke rêveker rave bike, da tu kes, tu rojname bi xalên poropagandaya rexistinî neyên tawanbarkirin…

Em ê weke komele li tevî hemû endamên xwe her li gel daxwaza bi şêweyeke azad bikaranîna ziman û daxwazên perwerdeya bi zimanê kurdî bin!

Komelaya Nivîskarên Kurd- Amed

Desteya Rêveber

Navnîşan: Gevran Caddesi 1. Akkoyunlu Sk. Kupik 9 Apt. Kat: 1 No: 2 Ofis/**Diyarbakır**
WEB: www.kurtyazarlardernegi.org.tr
Tlf-Fax: 0090 0412 224 33 12
GSM: 0090 533 655 69 85
E-Mail: komeleyaniviskaran@yahoo.com
komeleyaniviskaran@hotmail.com
a_irba@yahoo.com